



12/12/2019

Cenabê Serok Mesûd Barzanî

Di gel rêz û silavên germ, em dixwazin derheq xebata me ya Diyaspora çend zaniyariyên girîng pêşkêşî cenabê we bikin.

Nêzikî du sal in, bi beşdarîya 7 Federasyonên Kurd ji welatên Ewropî û Soviyeta berê xebateka koordînasyonê di navbera rêkxistinên Kurd li diyaspora dom kiriye. Di nav vê demê da me pênc konferansên taybet (*agahdarîyê zêde li dawîya nameyê da hene*) li welatên cawaz pêk anîn û xebata me li gor armancên ku me danîbû pêş xwe, berdewam e.

Di Konferansa Moskovayê da nûnerek li ser navê Cenabê we amade bû û peyama Cenabê we pêşkesî beşdarên konferansê kir. Herweha nûnerek ji mekteba rêzdar Nêçîrvan Barzanî di heman Konferans û Konferansên li Bruxsel û Kopenhagê hazir bû. Xebata me ya du salên bihûrî bi agahdarî, çavdêrî û rênimayîya Hikûmeta Herêma Kurdistanê birêveçûye. Ew xebate ji aliyê komîteyek hevbeş birêvedîçe.

Pirsa rêkxistinkirina xebata diyasporayê wek pîrseka girîng demeke ketiye rojeva kurdan de. Di herdu hevdiştinên me yê dawiyê bi Cenabê we ra (*berîya Referandûmê û di rojên merasîma sondxwarina Serokatîya Herêma*) derfet bo me çebûn ku em nêrîn û pêşniyarên xwe bi firehî pêşkesî Cenabê we bikin.

Pistî çend civînên taybet, reşnivîsa destûr û prensîbên giştî yê DIAKURDê di konferansa Kopenhagê ji aliyê nûnerên hemû Federasyonan ve hat pejirandin. Di wê Konferansê de herwiha biryar hat standin ku em di meha nîsana 2020 an da Kongra DIAKURDê encam bidin. Em di gel wê nameyê reşnivîsa destûra pêşniyarkirî ya DIAKURDê ji bo we dişînin.

Em dixwazin Kongreya Diakurdê bibe hingaveka dîrokî, platformeka hevbeş ya federasyon, sazî, dezgeh û kesayetiyên Kurd li diyaspora ji bo piştgirî û parastina berjewendiyên neteweyî.

Ji bo serketina armancên me yê hevpar em daxwaza alîkarî û piştevanî ya Cenabê we dikin. Em bi hêvî ne hûn bi bîr û nêrînên xwe yê giranbiha wê xebatê dewlementir bikin.

Spas û pêzanî ji bo destek û piştgiriya we, û bi hêvîya temenek dirêj û herdem serketî bo cenabê we!

Di gel silav û rêzan,

bi navê Komîteya damezrandina Konfederasyona Kurdên Diyaspora (Diakurd)

Keya Izol

Agahdarî derheq Konferansên Diakurdê:

- Konferansa Stockholmê – 10 sibat 2018
- Konferansa Moskova – 4 tebax 2018
- Konferansa Bruksel – 24 îlon 2018, salvegera referanduma serxwebûna Kurdistanê
- Civîna giştî Köln - 14 tîrmeh 2019
- Civîna giştî Kopenhag– 5-6 cotmeh 2019 Ji bo pejirandina reşnivîsa destûra DIAKURDê



۱۲/۱۲/۲۰۱۹

جەنابی سەرۆک مەسعود بارزانی

وتیری رێژ و سلاوی گەرم دەمانه‌وێت سەبارەت بە خەباتمان لە دیاسپۆرا (تاراوگە) چەند زانیاریێکی گرینگ پێشکەشی جەنابتان بکەین.

نێزیک بە دوو ساڵ، بە بەشداری ۷ فیدراسیۆنی کوردی لە ولاتانی ئەورووپی و سۆڤیەتی پێشوو خەبات بۆ رێکخستن و پتەوکردنی هاوکاری لە نێو رێکخراوەکانی کوردی لە تاراوگە بەردەوام بوو. لە ماوه‌یه‌ دا پێنج کۆنفرانسی تایبەتمان لە ولاتانی جیاواز (کە لە کووتای ئەم نامەیه‌ دا ئاماژە پێکراوه‌) ئەنجام داوه‌ و چالاکیه‌کانمان لە پێناو ئارمانجەکانی هاوبەش بەردەوامه‌.

لە کۆنفرانسی مۆسکۆ نوێنەرێک بە سەر ناوی بەرێژتان ئاماده‌ بوو و پەیاپی جەنابتان پێشکەشی بەشداریانی کۆنفرانس کرد. هەروا لەم کۆنفرانسه‌ و کۆنفرانسه‌کانی برووکسێل و کۆپننه‌هاگ نوێنەرێ مەکتەبی بەرێژ نیچیروان بارزانی ئاماده‌ بوو. خەباتی ئەم دوو ساڵه‌مان بە ئاگاداری، چاوه‌دێری و رێنمایی نوێنەرانی حکومه‌تی هەریێ کوردستان بەرپه‌چوو. ئەم کاره‌ له‌ لایه‌ن کۆمیتیه‌یێکی هاوبەش بەرپه‌ده‌چیت.

پرسی بەرێکخستنی خەباتی دیاسپۆرا دەمێکە وەک پرسێکی گرینگ کەوتوتووه‌ نێو رۆژه‌فی کوردان. لە هەر دوو دیداری رابردوو له‌ گەل بەرێژتان (لە سەردەمی ریفراوندۆم و لە مەراسمی سوێندی یاسایی خواردنی سەرۆکایه‌تی هەریێم) دەرفه‌ت چابوو کە بتوانین ر‌ا و بۆچوون و پێشنیاره‌کانمان بە فراوانی پێشکەشی جەنابتان بکەین.

دوای چەندین کۆبوونه‌وه‌ی تایبەت ر‌ه‌شنووسی دەستوور و پرنسیبه‌کانی گشتی دیاکورد له‌ لایه‌ن نوێنەرانی هەموو فیدراسیۆنه‌کان له‌ کۆنفرانسی کۆپننه‌هاگ پەسەند کران. لەم کۆنفرانسه‌ بریار درا کە کۆنگره‌ی دامەزراندنی دیاکورد له‌ مانگی نیسانی ۲۰۲۰ ر‌یکبەخه‌ین. ر‌ه‌شنووسی دەستوور له‌ گەل ئەم نامەیه‌ بۆتان دەنێرین.

ئاواته‌خووزین کۆنگره‌ی دیاکورد بێتته‌ هەنگاوه‌کی میژووپی، پلاتفۆرمێکی هاوبه‌شی فیدراسیۆن، ر‌یکخراو و ناوه‌نده‌کان و کەسایه‌تیه‌کانی کورد له‌ تاراوگه‌ بۆ پشته‌گیری و پاراستنی بەرژه‌وه‌نده‌کانی نه‌ته‌وه‌پیمان.

بۆ سەرکەوتنی ئارمانجەکانی هاوبه‌شمان داوای هاوکاری و پ‌الپشتی جەنابتان دەکەین. هیوادارین بە بیر و بۆچوونه‌کانی نرخدارتان ئەم خەباته‌ ده‌وله‌مه‌ندتر بکەن.

سپاس و پ‌ترانین بۆ پشته‌گیری و پ‌الپشتیتان و بە هیوای ته‌مه‌نیکی درێژ و سەرکەوتوی بەردەوامی بەرێژتان!

له‌ گەل س‌لاو و ر‌ێژ،

بە ناوی کۆمیتیه‌ی دامەزراندنی کۆنفیدراسیۆنی کوردانی دیاسپۆرا (دیاکورد)

کە یا ئیزۆل

ئاگاداری له‌ سەر کۆنفرانسه‌کانی دیاکورد:

- کۆنفرانسی ستۆکه‌ۆلم - ۲۰۱۸/۲/۱۰
- کۆنفرانسی مۆسکو - ۲۰۱۸/۸/۴
- کۆنفرانسی برووکسێل - ۲۰۱۸/۹/۲۴، س‌الفه‌گه‌ری ر‌یفراوندۆمی سەربه‌خۆی کوردستان
- کۆبوونه‌وه‌ی گشتی له‌ کۆلن - ۲۰۱۹/۷/۱۴
- کۆبوونه‌وه‌ی گشتی له‌ کۆپننه‌هاگ - ۵ و ۶/۱۰/۲۰۱۹ بۆ پەسەندکردنی ر‌ه‌شنووه‌ی دەستووری دیاکورد